Zincîra belavokêt Bingeha Êzidiyan li Dervey Welat

Jimare 2

hindek

Du´a u Dirozên Êzidiyan

komkirin u vekolîna

Dr. Xelîl cindî

Einbeck 1997

Naverok

Mijar	Rûpel
Pêşgotin	3-10
Du´a Êzdiyatiyê	11-13
Du´a Şêxîtiyê	14-15
Du´a Pîraniyê	16-17
Du´a Mirîdiyê	18-19
Du´a Xerqa	20 -21
Du´a Îmanê	22-24
Du´a Tokê	25-26
Du´a Sebrê	27-29
Du´a Xudanê Malê	30-31
Du´a Heyvê	32

Pêşgotin 2

li demê dawîda hindek Duʿayêt nu keftine ber destê min, tiştê agehiya me lê u berçavê me keftî, bi tinê yek ji van Duʿaya wa hatiye belav kirin, ew ji di govara (Laliş) da; ya ku êketiya êzidîya li Elmaniya der diêxe.

Ev Dûʿane me ji zarê heja Şêx Osman kûrê Şêx Birahîm standine. Ev ciwamêre şêxê şêxu Bekirane u li sala 1942ê li gundê Berhokê ser qeza Nisêbînê wê hatiye dinyayê. wek ew dibêje: hêsta zarok bû, di xewna xweda dibîne ew diçe Lalişe. Ew xewna xwe bi derew na êxîne, li temenê (emrê) 16 saliyêda-anku sala 1958 - berê xwe dide Lalişa mûranî u dibe xizmet karê mala Şîxadî u esqa ilme êzidiyatiyê, ´ilmê Şîxadî dikeve dilê wîda u li sala 1961ê ew diçe ber destê hostayê xwe (Koçek Sadiq), fêrî Dûʿa, Beyt, Qewl u qesida, sirove kirinên wan dibe. Şêx Osman neh salên temam li ber destê ciwamêr u Xudê jê razî Koçek Sadiq dimîne u ´ilmê Xudê jê fer dibe. wekî Şêx Osman ji mera gotî: ewi bitir ji (120) Qewl, Beyt Duʿaya u Qesîde ji Koçek Sadiq hilgirtîne, heke hindek her roj fêrî çend sebeqa dibûn, Şêx Osman, çunke maraqê wî li ser din hebû, ewî roj na Qewlek hildigirt.

Şêx Osman her ji sala 1958-1992 li Lalişê, Welat Şêx u Singalê dimîne, xizmeta wî li Lalişê bi vi rengê jêrî bu :

- sala 1958-1977ê ew qehweçiyê mala Şîxadî, çirayên geliyê Lalişê hildikirin.

-Sala 1971-1977ê dîsan ew Mîrhec bû.

-sala 1982ê ewi jinek ji Singalê îna.

- li sala 1992ê ewî Kurdistana başur bi ci hêla u hate Elmaniya, niha ji ew li bajêrê Detmold dimîne. Ev duʿayên Ii ber destên me, wek têkistên dînî, nek her pirr giring u ferin, belkî bo cara yekê têne nivîsîn. Ev Duʿane gelek bir u bawerêt dînê êzidîya, felsefa wan, gelek rastiya, girê u persiva gelek pirsiyara diden, migirtî (bo nimune) ji wan raman u fikir u girêya :

Sunet u hêvênê Sunetê. Erê Sunet di dîn u baweriya Êzidîyanda çî digehîne?...dan u standin bi (sinna) ´erebî u islamîve heye, yan tiştekî dîye?

Du´a u dirozên Êzidîyan----------Dr. Xelîl Cindî

Dewrê Melek Şêx Sin u girêdan u nasîna wî wek Şêxe Sunetê...
Şêx, Pîr, Mirîd... erê ji yek cudane, yek ji yekî kevintire, yan koka wan yeke? Erê gotina şêx, wekî hindek dibêjin, erebîye u gotina Pîr kûrdiye? Yan (Şêx, Pîr, Mirîd,...) ji yek serukaniyêne, hêvênê wan yeke?...
Erkan u ferzên dînê Êzîdiyan çîne?
Xerqe, dereca Xerqey di dînê Êzîdiyanda çiya?
Dîsan derheqa zaravê (ramaê) xêr u şer ji kûr tên?... ji hev diçudane, yan bi hevra digirêdayne?
Derheqa Tawsî Melek u simbola Gay u Masî?
Surra Tawsi Melek, Şîxadî, Êzî, Melik Sêx Sin, Sêsims, Melik Fexredin, Hesin Meman...
Zaravê Dûur, Surr, Candar, Mihbet, Tok...) çine? Sebir di nav Êzidîyanda ci digehîne?-.. ci fikir li ser Sebrê hatine û têne ava kirin?.... eve a gelek bîrên din di van heşt Du'ayan da xoya dibin u ronahiyê didene ser aliyekî giringî din u baweriya Êzidîyan. Her çende ez naxwazim li ser van pirs u girêkan bisekinim. Iê dixwazim bi rengekî kûrt li ser hindek ji *van* pirsan bisekinim.
Sunet, yan bêjin (Surra Sunnetê) parçeyeke ji hêza Xudê, demê wî dinya çêkirî, esas danî, ev Surre li gel wî bû. Sunnet hemu ew xuwastek u viyanên Xudêne; anku: qeza, qanun u çarenivîs, yên Xudê di berperên LOH- ALMEHFUZDA nivîsîn :

Ewe mehdera Êzidîya
ya Xudê ! roja te esas danî û çêkir
te hedû sed u her pênc ferzêt heqîqetê ji mera virêkir
Êziyê sor navê xwe lekir
*****
roja Surra Sunnetê kirin diyare
nura Meleka hate xware
ew ji mera kirin diyare
her yek li ser koka xwe girtibu ware.
(Sebeqa 1-2 ji Du'aya Êzidîyatiyê)

Ii hêreda wisa diyar dibit ku Xudê surra Sunetê berî Milyaketa dirûst kiriye.
Hêvênê spî, Kaniya Spî rastiyêt hem her u bê binin(الحقيقة المطلقة) û Êzî ji naveke ji hezar û yek navêt Xûdê :

Êzidîyatî şifaete
Kaniya Spî qublete
qubleta dinê u axrete.
(Sebeqa 7 Ji Dû'aya Êzidîyatiyê)

di virda bi aşkerayî (Sunet = xuwastek, qanun qezayêt Xudêne, ewêt li (Lewhl Mehfuz) da hatine nivîsandin u bi navê (Lalişa Nûranîve) hatine girêdan. Laliş ji rastiyeke herû here. Ew (Surre =Sunete = Lalişe) berî peyda bûna cî u dema (أزلي) peyda bûyne:

Sûnet more
pedşayi Lalişek avakir bu li jore
rêya Êzidîya bi hêf û core.

Surra sûnetê hebu
bi padşayî ra li xewle bu
ji berî çendî dem bu.
(sebeqa 8 -9 ji Duʿaya Êzidîyatiyê)

Li gorî baweriya Êzidîya; hêvênê Sunetê, Surra sunetê, her ji kevinda, berî peydabûna deman peyda buwe. Ew Surre wisa ma u Milyaketa nobe lêkir, bi rêka Duʿa u dirozan, mehbeta Xudê Êzidîyatî ma, berdewam bû. Êzidîyan jî îmana xwe bi Tawsî Melek û Milyaket û Xasêt din mikûm kir heta gehistine roja îro:

Ew Surr li wehdaniyê çêkir
Meleka nobet lêkir
roja Ida heciya ji mera virêkir.

Êzidî rawestan bi duʿayê
Surra Êzî gehayê
hinciyê safî Êzidî bê
agirê dojê negehayê.
(Sebeqa 10-12 ji Dûʿaya Êzidîyatiye)

Tim di Qewl û Dûʿayêt Êzidîyanda Şêx Sin wek Milyaket tête xoya kirin, her wisa bi Şêxe sunetê u Xûdanê Loh u Qelema tête nas kirin.
Heke (Loh u Qelem) berî her tiştekî peyda bûne u Xûdêye mezin tiştêt hey u neyî li dinyayê têda nivisîne u Şêx Sin kiriye rêber u xiznedarê (Loh u Qelem)a, her wekî di Duʿayêda jî der dikeve u Êzidî pêra di neqlînin, nek her eve, belkî navê Şêx Sin u Tawsî Melek bi hevra tê:

Tok ji Êzidîyara qebul kir
nûr bi nûrê (tehemud) kir
ewil Xudê silav li Melik Şêx Sin u Tawsî Melek kir
lew rêya Êzidîya ji guneha dur kir.
(Sebeqa 8 ji Duʿaya Tokê)

Dîsan di Qewl u ilmê dînê Êzidîyanda der dikeve, Şîxadî bi hemû mezintahî u padşahiya xwe, Melik Êêx Sin wek birayê xweê axretê u wek Şêcxê xwe qebul dike:

Şîxadî Melik Şêx Sin bi şêxitî qebiland
´Erş u Kûrsî jêra xemiland
Horiya li ezmana ji wanra hilhiland.
*****
Şîxadî Melik Şêx Sin bi şêxitî qebul kir
degehe ezmana vekir
bi nure (tehemid) kir
(Sebeqa 11-12 ji Dûʿaya Şêxîtiyê).

Dîsan sunet kirin - jêve kirina hindek goştî ji zarok u xortêt nêr u jê hatina xûnê - li cem Êzidîyan tiştekî batkêse, di virda jî xudanê sunetê her Melik Şêx Sine. Sunet kirin jî bi tor u tibetêt kevin u pîrozêt Êzidîyan tête nas kirin, wekî di bîr û bawerêt gelek dînêt kevinda têt: sûnet soza mirovane bi Xudê ra, ew ibadeta wî biken u xwe ji xirabî û nebuwa dûr xin:

Şêx Sin li ezmana Şêxe sunetê
li ´erda qewet da Nebiyêt omete.

belê Surra Melik Şêx Sin u Tawsî Meleke li ezmana, ewan wehî u keramet dane hemû pêxemberêt hatîne ser rûyê vê dindayê! ji aliyê zimanî ve jî u li pê hindek serçava(المصادر) wisa tê sirovekirin ku gotina (Sunet- Sin- Sinne...) ji (Hay Sin) hatibê. Hay Sin = ewêt ibadeta (Sin) dikin. (Sin) jî yek ji Xudanêt here mezin bû li cem Someriya- navê wî Nana, yan Inana bû - her wisa li cem Babiliya bi navê Sin bû. her wisa li cem Egiptan û miletêt Samî û Asûriyan. Wisa jî tê dest nîsan kirin kû (Hay Sin) guhorînêt zimanewanî bi ser da hatin u buwe (Haysî - Hîsî - Hîtît - Hîthît] u bi ´erebî buwe (هايسي - هيسي - هيتيت -هيثيت) evne jî ocaxek bûn ji ocaxêt binemala (Adiyaniyê u Mala Adiya). beramber u gel vê Ocaxê. Ocaxeke dine mala Adiya hebû jêra digotin (Hay Ur),

bê gûman (Ur) Xudanekî mezinî miletêt kevne, çunke ez ne piştrastim eve ki ji wan Xudanêt mezine, ji ber wê yeke ez hinde li pê vekolîna wî (wê) naçim, belkî dikarim bêjim (Hay Ur) bi aliyê zimanîve wa bûye (Harît - Harî- Horît-Horî-..) û bi erebî buwe: (هاريت - هوريت - حوري) Mêjunivîs (dirokvan) dibêjin: (Horî) berî Someriya jî hebûn u Someriya gelek axiftin zimanê Horiya ji xwera birin.
Belê, Sunet Şêxê Sunete, li gorê Mîtolociya Êzidîyan tiştêt ezmanîne, qeza u firwar, rêk u risim, hedû sedêt Xudêne, yêt ewî peyda kirîn u ji Êzidîyanra virê kirîn.
Erê piştî van hemû belge u ronkirina; çî peywendî u girêdan di nêveka (Suneta) Êzidîyan u (Sunne) Busilmana heye?.. kî ji wan kevintire u kê ji kê standiye?…bila dergehe vekirî bimîne, mirov bitir vekolîna li ser çêke...
Xaleke din, ya mirov li ser bisekine, doza Şêx u Pîr u Mirîdane, eve jî xaleke balkêşe di diyanetê Êzidîyanda. Heta demekî kin bawerî ew bu: Şêx u Pîr gûlêt darekêne u herduk ji mala Adiyane, çû cudayî di nêveka wanda nîne… ev rastiye jî me bi rengekî zanîştî di vekolîna xweda bi navê (ber bi zanîna rastiya dînê Êzidîyan, pişka sêyê, sala 1994 , bi zimanê ´erebî belav kir; têda diyar kir Şêx u Pîr u Mirîd jî, koka wan yeke, ji peyda bûna Ocax u hoz u esîreta bi hevra di girêdayî bûn u niha jî bi hevra di girêdayîne, u ew di dîrokêda pêşketîne.
Mixabin îro roj gelek ewêt xwe roşenbir nasdikin, Şêx u Pîra ji yek cuda dikin, dibêjin: Pîr ji Şêxa kevintirin. Yan (Pîr) gotineke kurdîye u (Şêx) gotineke ´erebîye, bêyî wê yekê hindekê xwe mandî bikin, hem ji aliyê dîrokîve, hem ji aliyê Mîtolocîve. Li gorî fikir u mîtolociya Êzidîyan: şêx berpirsiyare, delîle li dinyaya din, li axretê. Pîr nîsan u simbola Mirîdane. Merebî qasidê dadgehêye (mehkemêye), çunke li gorî fikra Êzidîya demê dimire, ruhha wî dibene ber dadgehê u li wêderê Merebî qasidê wê ruhêye. (Hosta) jî yê şîret u tegbîrane. Birê axretê: bo wê yekêye belkî xûdanê xwe ji agirê dojê rizgar ke, bibe behiştê.

Bila van Sebeqa ji mîtolociya Êzidîyan derheqa Şêx u Pîran bi rêz keyn :

Xûde Sêxîtî dahir kir
12 hezar Qewl u qesîde, Du'a u pêra virêkir
Êziyê sor tancê milukiyê li ber
ji ew paş Êzidîya li pê sefer kir

Şêxîtî fere
ji berî Nebiya, ji berî Pêxembera, ji
Sêxîtiyê hatibu 99 erkanê heqiyê
bi nûra kesik u sor u spî u zere
ya Xudê! tu li bikî(bibî) mefere

Şêxîtî more
hatibû ji xizîna jore
Surra Sêxîtîye ji Kaniya qubet li bidore
ya Xudê! tu li şiyar kî navê Êzîdê sore.

(Sebeqa 1-5-10 ji Dûʻaya Sêxatiyê)

yan jî temasayî van Sebeqa biken derheqa Pîraniyê:

Pedşayî Pîranî nazil kir
libsê rastiyê li ber kir
pîra li pê sefer kir
Pîranî bi navê Hesin Meman çêkir

Pîranî bi navê Hesin Meman çêkir
fitir u zekat pêra virêkir
Pîranî ji Şêxatiyê cihê kir
´emelê xirab terik kir
rêya Pîraniyê ber bi xêrê kir.

Şêx ji Durrêne
Pîr ji Surrêne
Feqîr candarêt Mewlêne
Mirîd li rêne.

(Sebeqa 1-5-9 j i Dûʻaya Pîraniyê)

Belê baş diyar dibit ku hêvênê Şêx u Pîra yeke, çunke (Durr u Surr) li gorî Mîtolociya Êzidîya ew (Hiyolî = matiryalê here pêşin, hêvênê ewil= هيولي) yê dinya u mirov u hemû tiştêt din jê peyda buyin, anku Şêx u Pîr du simbolêt pîrozin, ew yek bun, pasî ji hev cuda bûn.
ne wek her hêvênê Şêx u Pîra yeke, belkî bi derecekê Mirîd jî di gehine rêza wan, yan bêjîn: Şêx u Pîran jî navê mirîdiyê li ser wane; diyare ji ber wê yekê dibêjine wan (Dunav), deme Şêxê sêxî, yan Pîrê wî bête mala wî, wî demî ew Şêxê dibite mirêde Şêx u Pîrê xwe, her wisa bo Pîrî, demê Şêxê pîrî, yan Pîrê pîrî bête mala wî, wê rojê ew pîre dibite mirêde Şêx u Pîrê xweye.
Mirîdî wekî Şêx u Pîraniyê erkanekî here kevnî Êzidîyatêye:

Mirîdî fere
li nav wan danîn mehdere
rêya mirîdiyê herû here.
(Sebeqa 2 ji Du'aya Mirîdiyê)

ankû dikarîn bêjîn: kok u rêya Mirîdiyê jî digehte ser (Hêvênê Sunetê) u bi ava Hêwanê u Behiştê hatiye mor kirin:

Rêya Mirîdiyê nav hêvênê Sunetê danî
Şêx u Pîra, Mirîda baweriya xwe pê anî
rastiya wê li Birka cenetê hilanî
me sehde û îmana xwe pê anî
ya Êzî! tu hîvîya me bikî li ber rehmanî.
(Sebeqa 18 ji Du'aya Mirîdiyê).

Ye başe mirov di virda hindekê li ser ramana (Xerqey) jî bisekine. Li gorî mîtolociya Êzidîyan (Xerqe) yekemîn xelat bû, ji hêvênê Sunete, ji Êzidîyara hatî:

Xerqe ji Qendîla ezmana hate
li ser Şêxu Bakir kir bû xelate
pê sayî bun bi mas u berate.
(Sebeqa 15 ji Du'aya Xerqe).

Nîsan u ramana Xerqey çîye, boçî bi tistekî pîroz tê naskirin u dirba wî gunaheke mezine di nav Êzidîyanda?…ez na xwazim di virda persiva van pirsiyarêt dînî bidem, çunke babetekî taybet bi navê (Sinbol di edebê dînê Êzidîyanda) heye, emê li ser binvîsîn, jimara 2ê, di govara Roj da, jimara 3 dê hête belav kirin, li wêder emê bi dirêjî li ser raman û gotina Xerqey sekinîn, ji ber wê yekê na xwazim di virda li ser bi axivim.
Bi rastî em di karîn bêjîn: her Sebeqek ji van Du'aya dergehekî fikra dînê Êzidîyan ji mera vedike. Raman u bîrûbawerêt nu ser hildidin, simbol u navêt nû der dikevin; ku ew jî li ser fikreke dînî hatîne ava kirine u dergehêt vekolîna ji mera vedikin, migirtî (bo nimune- bo misal):

Momina îman nasiye
Tawsî Melek li ser pista Gay u Masiye
Tancê wî li ber kursiya Melekê Bêriye.
(Sebeqa 20 ji Dû'aya Imanê).

Bo zaniyarêt bitir mirov

dikare temasay simbolêt Gay û Masî bike kû me bi dirêjî di hijmara 2a Roj da li ser nivisîye, yan jî - derheqa Xerqey- berê xwe bidene ve Sebeqê:

Hûn Xerqey bînin biparêzin
xwe dur bikin, xêr u ser bi rêzin
da li roja axretê çirayê marifetê
li pê pêsiya we vegûhêzin.

Di virda hevgirêdana "xer u şer" yek ji bingeh u erkanêt felsefa diyaliktîkî diyar dike, ev fikre li ser wê çendêye çawa dinya ji tiştêt hevrik (وحدة الأضداد) pêk hatiye, her wisa ew hevrikne nikarin dûrî hev, bê yek bijîn. Li hêreda jî yeb buna kewne (وحدة الوجود) der dikeve, wisa nebe dinya û jiyan nameşe.
Belê di virda dixwazim pêşgotina xo bi dawî bînim, li ser wê hîvîyê me karîbit hindek fikrêt nû derxîne meydanê, mêjiyê asiqê Êzidîyatiyê pêve mijul kîn, dergeha jêra vekîn, da ew bikarin li paserojê hespê xwe li vê meydanê bi hajon, vekolînêt taze çêkin û heke kêmasiyêt me hebin serrast kin.

Xelil Cindi Einbeck-Elmaniya
Tirme/ 1997

Dû´a Êzidiyatiyê [1]

1- ewe mehdera Êzidiya
ya Xûdê roja te esas danî û çêkir
te hed u sed u her pênc ferzêt heqîqetê ji mera virêkir
Êziyê sor navê xwe lêkir.

2- roja surra sunetê kirin diyare
nûra Meleka hate xware
ew ji mera kirin diyare
her yek li ser koka xwe girtibu ware.

3-hêvênê sûnetê spîye
sûrra wê ji ber damana Êzîye
ya Êzîyê sor! tû li me û vî dînî bikî xoyîye
tû me xilas bikî ji nexosîye.

4-Êzidiyatî miraze
Êzî karê rast ji me dixwaze
jêk kivis bibin pisêd baza.

5-Êzî li xewleye
ew mihibê kasa xweye
ew bi kesî neyî hewceye
ew minetkare ji mêrê: bi edeb, erkan, bi heye.

6- Êzî li xewle bû
ew bi kesî ney hewce bû
ew mihibê kasa xwe bû

7-Êzidiyatî sifaete
Kaniya Spî kir qûblete
kir qûbleta dinê û axrete.

[1] min ev dûeane ji zarê sêx Osman kûrê sêx birahîm wê di girtîn. Sêx Osman sêxê sêxû Bekirane û ew li sala 1942ê li gûndê berhokê, ser bi qeza nisêbînê/ tirkiya, wê hatiye dinyayê. Sêx Osman li sala 1958ê wê hatiye Lalisê û buye skestî û xizmetkarê mala Sîxadî. pisî sê sala bitir û bitir esqa تzidiyatiyê di dilê wîda gerim dibe û li sala 1961ê diçite ber destê hostayê xwe koçek Sadiq li behzanê; elm û zanîna dînê Êzidiya hildigire.bitir ji 30 sala ew xizmeta Lalisê dike û pasî hindekê li behzanê û hindekê li Singarê dimîne, li wêder di zewice û kûrek jêra çêdibe û li sala 1992 Welat sêx bi cî dihêle tête Elmaniya.

8- sunet more
Padşayî Lalişek ava kir bû li jore
rêya Êzidiya bi hêf u core.

9- surra sunetê hebû
bi Padşayîra xewle bû
ji berî çendî dem bû.

10-ew sûrr li wehdaniyê çêkir
Meleka nobet[2] lêkir
roja îda heciya ji mera virêkir.

11-Tawsî Melek bu îman
Melik Şerfedîn bû dîn
Melik Adî bû ol
Melik Êzî bû atqad
Melik Şemsedîn bû mefer
Melik sêx Sin bu sifaet
Sêxû Bekir bû mewla
Melik Fexredîn bû rêber
ewê rojê, ji mera danîn hed u sed.

12-Êzidî rawestan bi du´ayê
surra Êzî gehayê
hinciyê safî Êzidî bê
agirê dojehê ne gehayê.

13-Êzidî bi emelê çak gehiştin benda êmanê
Meleke rawestan li dîwanê
Şêxû Bekir li ser berê sekanê
Şêx Şems ji Êzidiyara çiraye li dîwanê
ya Êzî! tu li me bikî xudanê.

14-hinciy Êzidiyê ´emel saf bin
hûnê ji axretê hîvî bin
hûnê li dîwana Êzî bin
bi xoşî u şahî bin
hûnê li axretê bi xoyî bin.

15-axret mala heqe
Melek rawestan li çarde tebeqe
ji Êzidiyara dahir kir girîvanê heqe

[2] Nobet, nobedarî: pawan kirin, çavdêrî, parastin, guhdan,....

16-ji Êzidiyara anîn ilmê batinê
Pedşa êkî bi tinê
hincî Êzidiyê ne yî safî bê
derê dojê ji wan ra vekirî bê.

17-bêjim we gelî sunetê
hûn desta ber ne din ji terîqetê
da Melik Şêx Sin li we bikit şifa´etê.

18-ew bû du´a mehdera Êziye
Tawsî Melek da destê Şêx Fexrê Adiye
ya Êzî! me bi te hîvîye
tu me xilas bikî ji tengiya, ji te´liye.

¤ ¤ ¤ ¤ ¤

Du´aya Şêxîtiyê

1- Xudê şêxîtî dahir kir
duwanzde hezar qewl u qesîde
du´a u diroze pêra virêkir
Êziyê sor tancê milukiyê li ber kir
ji ewpaş, Êzidiya li pê sefer kir.

2- Êzî bi şêxîtiyê xwe nas kir
her pênc ferz li xwe fer kir
rêya axretê bi mal u ser kir.

3- rêya şêxîtiyê, rêya axretê
danîn 99not u neh erkanê heqîqetê
em li ber dikin xilmetê u ´ibadetê
îro dinyaye, sibe bangê axretê
ya Xudê! tu li me bikî şifaetê.

4- Şehîd pêxember bi şêxîtiyê bû heste
ewî ne pê hebû, ne deste
Êziyê sor ronahî li ber wî jî di xiste
ewî miraza xwe ji Xudê di xweste.

5- şêxîtî fere
ji berî nebiya, ji berî pêxembera
ji şêxîtiyê hatibu 99 not u neh erkanê heqîqetê
bi nûra kesik u sor u spî u zere
ya Xudê! tu li me bikî mefere.

6- Şêxîtî 99 not u neh erkane
ewil ´ibadet zimane
nasbûnî serxitmê wane
ya me sidqe u îmane
li bangiya me bê Melekê rehmane.

7- Şêxîtî miraze
Xudê rêya heqiyê ji mera dixwaze
ya Xudê! tu miraza me bikî li ber berê miraze.

8- Şêxîtî ferzek ji yêt îmanê
Meleka meclis girtibû li dîwanê
ya Xudê!tu me bigehînî wê hizurê,wê erkanê.

9- Şêxîtî ferzek ji yêt dîne
hinciyê rêya şêxîtîyê girt bi êqîne
şêxîtî bi mêr u mehbet şêrîne
ya Êzî! tu hîvîya me bikî ji dîwana Rebil alemîne.

10-Şêxîtî more
hatibû ji xizîna jore
surra şêxîtîyê ji kaniya qubet li bidore
ya Xudê! tu li me şiyarkî navê Êzîdê sore.

11-Şêxadî Melik şêx Sin bi şêxîtî qebiland
´Ers u Kursî jêra xemiland
horiya ji wanra li asmana hilhiland.

12-Şêxadî Melik şêx Sin bi şêxîtî qebul kir
dergehê asmana vekir
bi nûrê <<te´mid kir.

13-Sêxadî dîndara xwe ji...
Şêxadî navê xweyê şêrîn lêkir
dar u bera sicude pêkir.

14-Surra Şêxadî hate ´erda
li nav şêxatiyê danî hed u sede
nav u dikrê wî tijîye ji asmana heta bi ´erde
ya Şêxadî!tu ji pêşiya me hilînî kul u derde.

15-Şêxîtî miraze
hinciyê bi şêxatiyê dilxwaze
ewê li axretê bigehit dîwana baza
Xudê dê hasil bikê miraza çendî mirazxwaza.

16-ev bû du´a sêxatiyê
ji Xudê di xwazîn hîvîyê
tim miraza me bikî li ber Kursiyê.

¤ ¤ ¤ ¤ ¤

Du´a Pîraniyê

1- Pedşay pîranî nazil kir
libsê rastiyê li ber kir
pîra li pê sefer kir.

2- pîranî bi navê Hesilmeman çêkir
fitir u zekat pêra virêkir
pîranî ji şêxatiyê cihê kir.

3- karê xirab terik kirin
rêya pîraniyê ber bi xêrê kir
Padşay dûea pîraniyê nazil kir.

4- pîranî bi Hesilmeman dibû êqîne
hinciyê xwe ji guneha vekişîne
axret raste,ev dinya fêniyeke derewîne.

5- pîranî şêrîne
li heqiyê dibîne
ewê xwe bi dîwana Hesilmeman bigehîne.

6- pîranî hate erda
ji her pênc ferza, yek jê serda
ew miraze li ser dilê bi derde.

7- pîranî ferzek ji yêt heqîqetê
Melik sekinîn li se´detê
momin rawestan li ´ibadetê
em şayîne li vê xilmetê.

8- şêx ji durrêne
pîr ji surrêne
feqîr candarêt mewlêne
mirîd li rêne.

9- mirîd bi danê
pîr bi erkanê
şêx xûndkarin li dîwanê
ewe ciyê dîn û îmanê

10-dîn u îmanêt me ji wêye
êqîna me ji wê hewdêye
loh li mehfuz navê Xudêye
ya Hesilmeman! tu me bigehînî wê xêrêye.

11-pîranî surre
hûn bi xof bin, bi tirs bin ji hemû dile
da hûn li axretê bibin xudanê mezele.

12-da hûn li axretê çê bin
bi xêr, xoşî, şayî, da tebayî xelkê geyî bin
da hûn ji dîwana Hesilmeman bi hîvî bin.

13-pîranî xelate
surra pîraniyê ji asmana hate
da destê wan, maş u xelat û berate.

14-rêya pîraniyê 99 not u neh erkane
ji not u neha sê xoyane
yek rastiye, yek heya, yek îmane.

15-Hesilmeman! me ji te hîvîye
tu hîvîya me bikî ji dîwana Melkê bêrîye.

16-pîranî, Hesilmeman serwere
Melek sekinîn li mehdere
da destê pîra mişura zere
ya Hesilmeman!tu hîvîya me bikî ji dîwana Melekê ekbere

17-rêya pîraniyê bi rêzin
hûn xwe ji guneha biparêzin
da li axretê, çirayê marifetê li pêsiya we vegûhêzin.

18-pîranî bi naşîne
lazim heqiyê bibîne
divê rêya pîraniyê çu misêmayî tê nemîne.

19-bi mêr u mehbet sêrîne
ya Hesilmeman! em ji bi hîvîne
tû derman bikî dilê birîne.

Du´a Mirîdiyê

1- Xudê mirêdê xwe bi çî naskir
bi şêx u pîr, hosta u merebî, yar u birayê axretê
li dest damana wan girtin
xwe ji agirê cehnimê xilas kir

2- mirîdî fere
li nav wan danîn mehdere
rêya mirîdiyê her u here

3- Ya Şêşims! tu li me bikî mefere
ya Melik Fexredîn! tu ji mera bibî rêbere
me hîvî ji Xudê heye
em li ber damana her pênc ferzêt heqiyê bin sela.

4- Mirîdî rêyek ji yê dîne
hinciyê rêya terîqetê bihebîne
li dilê wan namînê; kerb û qehr û kîne.

5- Rêya mirîdiyê tenge
ji dîwana Êzî hat denge
rêya mirîdiyê 99not u neh renge.

6- Mirîdî nehdeye
bi Tawsî Melek den sehdeye
rawestan li ber her pênc dergeye.

7- Rêya mirîdiyê spîye
hinciyê Tawsî Melek girt bi rastîye
ewê li axretê bibînê xosî û sayîye.

8- Libsê mirîdiyê li ber xwe kin
her pênc ferza li ser xwe fer kin
rêya mirîdiyê bi mal û ser kin.

9- Mirîd bi xifê gehiştin mirazê
hiciyê rêya mirîdiyê ne xwazê
roja bangê axretê Padsa; heqiyê, neheqiyê
ji wan di xwazê.

10-mirîdî eynete
Padsayî li nav wan danî mehbete
ji ew pas, mirîdiyê girt hed û sede.

11-ev bu sûrra ji pês
em li pê wê sûrrê bikin teftês
Padsa li pêsiya mirîdiyê nahêlê; ne kûle,
ne jane, ne ês.

12-mirîdî bi wê sûrrê rêya Xûdê nas kir
bi xofê xwe xilas kir
mêr bi xêrê digehne ber Padsayî.

13-mirîdî bi wê sûrrê girtin rêzane
li pêsiya wan gurî bû mom u çirane.

14-Mirîdî bi surrê girtin raste
me rê girtin bi marifete
hinciyê bi saxî girtibû terbiyete
ew ruh, roja axretê li ber Padşayî bi hizrete.

15-Mirîdî mehdere
Melik sekinîn li ser menbere
Melik şêx Sin şifa´ete
Melik Fexredîn rêbere
Şêşims mefere
hûn hîvîya me bikin li dîwana Melkê ekbere.

16-Me bi mirîdiyê qebule
ji berî xet u misure
Sêsims nure
Melik şêx Sin xefure
ya Tawsî Melek! tu hîvîya me bikî li dîwana Melkê xefure

17-Rêya mirîdiyê 99not u neh erkane
ji not u neha sê li nav wan dane
yek rastiye, yek heya, yek îmane
ya Êzî! tu li me bibî xudane
tu hîvîya me bikî li dîwana Melekê rehmane.

18-Rêya mirîdiyê li nav hêvênê sunetê danî
şêx u pîra, mirîda, baweriya xwe pê anî
rastiya wê li birka cinetê hilanî
me şehde u îmana xwe pê anî
ya Êzî! tu hîvîya me bikî li ber rehmanî.

¤ ¤ ¤ ¤ ¤

Du´a Xerqe [3]

1- Padşayê min Xerqe sewirand
Edrîsî xeyat[4] fesiland
şêx Bekir li pê neqiland
rêya îmanê hesiland.

2- Li pê neqiland feqîra
hinciyê terik bike xirab u fêniya u wîra
ewê xelat bibê bi mifte u kilîla
ewê bigehê dîwana mîre.

3- hûn xerqe hilînin
li pê feqîra bisînin
da feqîr bi serê xwe hilînin
feqîrî erkana ser deynin.

4- Hiciyê hay ji maniya xerqe di buwe
ew safîne, yek ruwe
ya Xudê! tu miraza me bikî zuwe.

5- Xerqe miraze
hinciyê bi erkanê xerqe bêtin behse
ew xerqe roja axretê ji wanra bibit sehde

6- Hûn xerqe bînin biparêzin
xwe dûr bikin, xêr u şer bi rêzin
da roja bangê axretê çirayê marifetê lipêsiya we veguhêzin

7- Xerqe sitare
hinciyê vexwar ji kasa tale
feqîrî ji wîra helale.

8- Feqîrî 99not u neh erkane
ewil îbadet u zimane
naskirin ser xitmê wane
ya Tawsî Melek!tu miraza me bikî li ber Kursiya rehmane

[3]li gorî bawerîya Êzidiya Xerqe ewil xelat bu, ji hêvênê sûnetê, ji mêrê Êzidîra hatî.
[4]li nav Êzidiya ev kesne Xerqey hildigirin: sêxên sêxû Bekir,babkek ji sêxên sêx Sina,hemu pîrên Omerxala, du babkên mirîda, feqîrê boqtêra< Boqdar>, feqîrê temînîdar.

9- Feqîrî 99 not û neh erkanêt miqerimin
heke we bivê ji 99 not u neh erkana sêya bielimin
da hûn li dîwana mîr biwesilin.

10-Erkanek jê rastî
Padşa ji ba xwe veguhastî
bû mom u çirayê pêsiya wan veguhastî.

11-Erkanek jê nasîne
hinciyê rêya Xûdê heq bibîne
li dilî namînê, ne qehre, ne kîne
ya Tawsî Melek! tu hîvîya me bikî li dîwana Rebil Alemîne

12-Erkanek jê heyaye
Padşa ji ba xwe kir peydaye
pêşiya wan gûrî bu mom û çiraye
em miraza xwe dixwazîn ji Xudaye.

13-Xerqe (setar eyûbe)
hinciyê bi ol u erkanê xerqeve bêtin zube
ew Xerqeye li axretê, ji mêrara danî hed u sed, rê u tixube.

14-Xerqe sitare
derwêşa li pê wî xelatî kir teftêse
Meleka li asmana sema qanunî kêsa
ya Xudê! me ji te hîvîye: tu li dilê me ne hêlî çû kul u derda u êşa.

15-Xerqe ji qendîla asmana hate
li ser Şêxu Bekir kir bû xelate
pê şayî bûn, bi maş u berate.

¤ ¤ ¤ ¤ ¤

Du´a Îmanê

1- Îman bi çî nîsane
berî, ne erd hebu, ne asmane
ne behir hebû, ne binyane
ne çiya hebû, ne sikane.

2- Rê hebû ma´rifete
îman hebu terîqete
ewê rojê Kaniya Spî kir qûblete.

3- Kaniya Spî bû qûbleta mêrane
ji berî erd u asmane
ji berî erd u binyane
ji berî çiya u sikane
da medeha jê bideyn bi nîşane.

4- Em çendî medeha jê dene
ji berî Loh u qeleme
ji berî72 heftî u dû Ademe
ya Êzî ji berî 90 not hezar salî ez li ba teme!

5- Berî 90 not hezar salî ez li wê bum
ne ji bab bûm, ne ji dê bûm
ez li ber kerema Mewlê bum

6- Ez birme ber kerema wî Mewlayî
ez dame destê wî hostayî
ji mera kirbu xoşî u şayî.

7- Yê xoşî şayî ji mera kirî
ez birme ser terîqa Melkê faxirî
min nezanî tû Xidir bin Xidirî.

8- Xidiro bin Xidir
te kasek da me bukir
me vexwar bi nav u dikir.

9- Te kas ji mera anî
me vexwar wek tu dizanî
lew te ez birme ser ´ilmê qatanî.

10-Ji Qatanî we dibême
bi ma´rifet u erkanê çême
da medehê ezîz Melik Fexredîn bême.

11-Da bideyn medehê ´ezîz Melik Fexredîne
kengê ji mera têtin mizgîne
wê rojê, wê derkevin xîvetên tereb zêrîne.

12-Îman weke çave
heke mûwek kete nave
xoyî ji ber heyrî, tengave.

13-Heke ketiyê mûwekî bitinê
xoyî na sekinê li ber sotinê.

14-Me îman naskir
hinciyê bi xofê helal xwe derbaz kir
ewan xwe bi wê xofê, ji dojê,ji destê zebêniya xilas kir.

15-Hinciyê bawerî bi îmanê anî
îman behre jê diçin co û kanî
momina sehde û baweriya xwe bi navê Tawsî Melek anî.

16-Tawsî Melek bi wê îmanî gehişte ber Kursiyê
momin ber bendin li hîvîyê
tu bîniya pêsiya me xofê, heqiyê.

17-Libsê îmanê spîye
nazike, letîfe, yi qewîye
me hingêvnê gelî Êzidiya!
ew zu xeyirîye.

18-Rêya îmanê fere
ji berî nebiya u çiqas pêxembera
îman bi ser hêvênê sunetê danîn
me bi navê Tawsî Melek behwere.

19-Îman bi emelê spîye
ji berî erd, asman û zevîye
bû mehder li ser Êzidiya.

20-Momina îman nasîye
Tawsî Melek li ser pista Gay u Masîye
tancê wî li ber Kursiya Melekê bêrîye.

21-Tawsî Melek bi xwe îman ji hêvênê sunetê qebul kir
Tok u erkan u xelat lêkir
cinet ji wan u ber jêr kir.

22-cinet ji wan ber jêr kir
Şêşims bu mefer
Melik Şêx Sin bû şifa´et
Şêxu Bekir bû mewla
Melik Fexredîn bû rêber
Melik Nasirdîn bû celad
Melik Sicadîn bû qasid

23-Rêya îmanê jêra bi xêr u bêr kir
hûn rêya îmanê bi ser nedin
cehwera bi der nedin
da hûn dîwana xasa bi ser nedin.

24-Ew bû du´a hêvênê sunetê
Tawsî Melek wê ser berê se´detê
ji me dixwazê xilmetê, rastiyê, îbadetê.

25-Me îman bi Tawsî Melek tê
îman bi wê xilmet u îbadetê
heta roja qiyametê.

¤ ¤ ¤ ¤ ¤

Du´a Tokê

1- Padşayî ji mera virêkir Toke
ketibu dilê Êzidiya şayî u soqe
destê Tawsî Melek li ser stêra eyoqe.

2- Padşayî Tok ji mera virêkir
ava cinetê lêkir
ewî xoşî u şayî ji mera çêkir.

3- Wextê Tok şiyandin
Meleka qapiyê asmana vekirin
horiya li asmana hilhilandin.

4- Tok ji Êzidiyara ziyarete
rêya wê bi xilmet u ´ibadete
ew jî ferzeke ji ferzêt heqîqete.

5- Tok ji mizgîne
Tawsî Melek nav sêrîne
emînê dîwana (Rebil alemîne)
Êzidî jê bi hîvîne.

6- Êzî Tok ji qûba felekê deranî
navê xoyê şêrîn li ser danî
Êzidiya bi serê xwe hilanî
me şehde û îman û baweriya xwe pê anî.

7- Tok girîvane
bi qirara Xudê u her heft Melekane
bi sehdeya Şêxadî u Melik Şêx Sin u Dawidî bin dermane
du´aya Tokê silametiya rêyane

8- Tok ji Êzidiyara qebul kir
nûr bi nûrê (te´emid) kir
ewil Xudê silav li melik Şêx Sin u Tawsî Melek kir

9- Tok girîvanê raste
hinciyê li rêya girîvan safî bête
ewî dinya terik kir, axret stande

10-Tok xelatekî bi more
hatibu ji xizîna jore
danî ser milê Êzidiya, bi qirara Êzîyê sore
rêya Tokê bi hêf u core.

11-Tok hat ji dîwana Melekê bêrîye
hinciyê bi rêya Tokê biçîye
ewê bibê serhevdê mala Adîye.

12-rêya Tokê, rêya axretê
Meleka dîwan girtin li seedetê
ya xûdanê Tokê !tû li me bikî sifetê
em ji te dixwazîn îmanê û marifetê.

13-Tok ji asmana hate
nazil kir 12dûwanzde hezar xelate
ji mera xirêkirin mas û berate.

14-Tok misure
hatibu ji ersê jore
hinciyê rêya Tokê rast girt; Xûdê tim ji
wîray xefure.

15-hêvênê sûnetê Tok li ser xwe kir
me li pê bawer kir
rêya Rokê mal û ser kir.

16-rêya Tokê bi ser û male
------ Du´a u dirozên Êzidiyan------

sûrrê batinê 99 not û neh hezare
Tok bu xelatê momina, ne yê gûnehkara
bê baweriya bavêjin dojê, devê mara.

17-ya Xûdanê Tokê! me ji hîvîye
me û تzidiya
tû hîvîya me bikî ji(li) dîwana Melekê bêriye.
¤ ¤ ¤ ¤ ¤

Du´a Sebirê

1- Xudanê sebrê sebir çêkir
navê xweyê şêrîn lêkir
erkan, marifet vêra virêkir.

2- Xudê sebir kir sikane
Melik ji nûra wî hatine xware
bi wan ava kirbû ´erd u asmane.

3- Sebir delîle
nazil bû ji qendîle
danîn ser perda feqîre.

4- Ewan bi sebrê xwe nasî
Êzî bi wê sebrê dahir bû bi hezar u yek libasî
li behra gerabû bi rengê Masî.

5- Sebir Rehmane
li cinetê Meleka girtin dîwane.

6- Sebir sikana ewliye
hinciyê sebir nasiye
ewê bibînin xosî û sahiye.

7- Sebir Rehmane
Meleka girtibû meclis u dîwane
sebir kir delîlê rêyane.

8- Sebir erkana çêye
hinciyê marifet u erkan divêye
ew sebir silametiya rêye.

9- Bi wê sebrê derwêşa mal u mezel terk kirin
şevê, rojê ´ibadet kirin
emîn cibraîl serdanê xêrê li wan kirin
ew derwêş ji agirê dojê efû kirin

10-Sebir xelatekî Pedşaye
ji ba xwe kir peydaye
bi wê sebrê li ber wan ewliya
gurrî bu mom u çiraye.

11-Ew sebir da Gay u Masiye
bi wê sebrê Xudayê xwe nasiye
çarde tebeq li ser milê wiye.

12-Bi wê sebrê Heyv u Roj li asmana danîn
perda wan li Kaniya Spî u Sîhanê hilanîn

13-Xudê bi sebrê erd û asman xemiland
horiya li Quba felekê hilhiland
Xudê çar durr efirand
riknê erd u asmana pê sekinand.

14-Padşayî bi sebrê cinet çêkir
Meleka hoste pêkir
dilê emelçaka xwes bû
dilê xiraba ber bi jêr kir.

15-Horî u Meleka bi sebrê gehistin îmanê
hatin xweyê sebrê u sikanê
bi wê sebrê gehistin wê hizretê,wê dîwanê wê keyfê,wê seyranê.

16-Erkanek ji wê sebrê rastî
Padşayî ji ba xwe bîrastî
ew sebir bû mom u çira
li pêşiya wan vegûhastî

17-Erkanek ji wê sebrê nasîne
hinciyê rêya Xudê girt bi êqîne
ew rêya mêr u Meleka bi heq dibîne.

18-Erkanek ji wê sebrê heyaye
Padşay ji ba xwe kirbu peydaye
bi wê meclis bi navê Şêxadî u Melik şêx Sin avaye.

19-Sebir xweş hesare
(te´mîda) wê ji behra nîle
bi wê sebrê; Izraîl, Cibraîl, Mîkaîl, Dirdaîl
Sifqaîl, Izrafîl, Israfîl bûn pîre.

20-Bi wê sebrê Meleka ava qalibê Adem anî
li ava Kaniya Spî hilanî
bi wê sebrê qalib ê qalib çêkirî.

21-Heşt sed salî ruh pê anî
bi wê sebrê Meleka Adem li cinetê danî.

22-Adem bêsebir,rêya Tawsî Melek girt bi nezanî
li ber nema sebra rehmanî
heta xwe ji cinetê deranî.
¤ ¤ ¤ ¤ ¤

Du´a Xudanê malê

1- Ya Xudê, Xudanê malê tu li me bikî serdanê
em ji te dixwazin tifaqê u marifetê û îmanê
me hîvî ji te heye,tû hîvîya meû Êzidiya bikî li dîwanê

2- Em rawestan li ber Xudanê malê
tu li dilê me bikî sîqalê
tu li pêşiya me hilînî; kerbê u kînê
bidî pêşiya me; xofê u sebrê u erkanê
tu yî Xudanê sebrê u sikanê.

3- Xudanê malê ji malê dixwazê medeha
em rawestan li ber çarde dergeha
emê miraza xwe bixwazin ji xudanê wan qubeha

4- Xudanê malê, xudanê quba nûrîne
kursiya wî serbanê ´erşê ´ezmîne
li ber di îsyêt şemalê nûrîne
me hîvî ji te heye,tu hîvîya me bikî li ba (Rebil Alemîne)
em dîm ji te u wan surr u kerema bi hîvîne
tu emelê bas bidî me, karê xirab ji pêsiya me hilîne.

5- Ewan gunehkara Xudanê malê nas ne kirin
xwe ji rêya Xudê dur kirin
derê qeda u bela li xwe vekirin
zebêniya roja axretê,ew li geliyê waweylê werkirin.

6- ew Xudanê malê xof u rehim li dilî kirin
me hîvî ji Xudanê malê heye
mom u çira li ber vekirin
ew ji dûwanzde hezar bela dur kirin.

7- Ya Xudanê malê ji cineta mîre
lê êwirîn coqetêt feqîre
rêya me bi hosta, şêx u pîre.
8- Xudanê malê navek jê Melekê Bêrîye
hinciyê rêya heqiyê nasiye
ewê bibê serwerê mala Adiya.
9- Eve bu du´a Xudanê malê
mala heqiyê, dîm em berdin hîvîyê
em dilxwesin bi wê xoşî u şahiyê.

10-Xudanê malê li biket xoyîtiyê
Meleka dilê aşiq u momina xweskir
dilê xirab û beygoya terîq kir.

11-Xudanê malê, Xudanê cara
hinciyê bi terîqetê dijmine
roja axretê barê wî hesine cizayê wî sotine.

12-Hinciyê li Xudanê malê neyî guhdare
yê wan li axretê bavêjin dojê, devê mara
ew bê şêx u pîr,hosta u merebî,birayê axretê bê extiyare
roja hisabê, bê ciye, bê ware

13-Me bi Xudanê malê behwere
ji mera sekinîn li mehdere
Melik wê li ser menbere
Xudanê malê ji mera anî toka zere
ya Xudanê malê! tu ji dilê me hilîne kul u kesere
tu li me bibî mefere.

Du´a Heyvê(*)

1- Me heyveke xoye nû dîye
durreke qîmetîye
ser tancekî resî nûranî di îsîye
qubleta min Kaniya Spîye
mesebê min Şêşimsê Teterîye.

2- Fexro! tu Fexrekî di cîde
xudanê ´ilmê be´îde
tu wê li ber kerema Siltan Êzîde.

3- Ez Êzîdê cidê xome
medeha jê vedideme.

4- Şêxek rabû ji Şamê
avakir Laliş meqamê
bo dîndara Şêx Fexrê Adiyanê.

5- ya Melek Fexredîn!te em xûndîne li hizretê
tu me bisitrînî ji dirba Xerqê
ji şerîetê, ji terîqetê
şikir, te em havêtîne ser pişka sunetê.

6- Yya Melik Fexredîn! me ji te divêt :
fira dest u Ol û terîqet.

7- Bimbarik ya pîroz
yêt hesud, çav spî di boz
8- Ya Melik Fexredîn! heyva nû, qismetê kevin
ya Melik Fexredîn! heyva nû, qismetê kevin
ya Melik Fexredîn! heyva nû, qismetê kevin.